



ZANÛYARIYÊN TÊKILDARÎ MIJARA PARASTINA ZAROKAN



Save the Children

Zanyariyên taybetî kedkarên Rêveberiya
Wergirtinê ya parêzgeha Niedersachsen'ê

Têderxistina berxeterbûna tenduristiya zarok û tevgeriyana bi şêwaza durist

Dema ku xetereke mezin hebe ku **tenduristiya derûnî an leşî** ya zarok tûşî zîyanê bibe, qala berxeterbûna tenduristiya zarok tê kirin. Hegera vê zîyanê dibe ku ji ber babetên xwarê be:

- Dêûbav erka xwe ya sergêrî û serperestiyê wek mînak ji ber bêhaybûnê neçê bi kar tînin,
- Serneketina dêbavan di pêkanîna erkên xwe da bêyî ku sûcdar bin an jî
- Tevgera kesekî sêyem.

Ev yek girîng e ku bikarî binirxînî ku gelo tenduristiya zarokekî an nûciwanekî li ber xeterê ye an na. Babetên neasayî dibe ku di vî warî da zanyariyên diyarker raberî te bikin. Ev babetên neasayî nişaneyên diyar ên kiryarên dijî zarok û nûciwanan in ku li gorî wan dibe ku xetera zîyan û zerara li ser tenduristiya derûnî, leşî an rûhî ya zarok an jî nûciwanekî gengaz be.

Em di dewamê da **hin mînakên berxeterbûna tenduristiya zarok** ji bo te raberî dikin - Ev mînak dibe ku alîkariya te ji bo baştirkirina nîrxandin û têgihîştinên te bike. Ji kerema xwe van mînakan tam û tamam nezane.



- Dîtina berdewam a nebûna xwarek, kinc, çavdêriya leşi, miqatebûna/tedawiya bijîşkî û babetên wiha bi qasî têrê



- Nebûna çavdêri û parastinê li hemberî xeteran



- gefa li tundûtûjî û sersariyê,
- qêrîn, dijûndan, diyarkirina hesta nefretê derheq zarok, tundûtûjî,
- neçêbikaranîna cinsî, tevgeriyana nebaş di gel endamekî din ê malbatê,
- sînardarkirin an pêşigirtin li pêwendiyên zarok ên civakî,
- Zewicandina bi zorê û wekî wê



- lêdan, hejandin,
- hebskirin,
- Fetisandin, girêdan,
- Şewitandin û weke wê



- dayîna destûra pevçûnên şidetbar (tundûtûjiya hestbarî, leşi û cinsî) navbera dêûbav/kesên din ên jêderk,
- Wek mînak lêdan, pêhlêdan, derbelêdan, dijûndan, gefxwarin, azirandin, biçûkkirin, destdirêjîya cinsî li ser bav/ dayîk/ kesên din ên jêderk û weke wê



- Neçarkirina bo çalakiyên sûcdariyê (xebata zarokan, parsekî, leşfiroşî, dizîn) û weke wê

Nîşaneyên îhtimalî yê berxeterbûna tenduristiya zzarok li zarokan



- xwarina nebaş û nebes an kêşeya xwarinê,
- bêhna pîs,
- birînên dermannebûyî,
- westiyana berdewam,
- kincên neguncan li gorî guherînên keşûhewa,
- reşûşînbûn, cihên birînê,
- nexweşiya berdewam, şikestina hesityan,
- ducanîbûnên berwext û / an jî nexwestî,
- Guherînên pêşketina leşî, nîşaneyên xebata fizikî (rewşa destan û / çerm, êşa kemerê) û hwd



- berteka sînordar li hemberî handanên dîtbarî û bihîstinî,
- nakokiyên têgihîştin û birê,
- lawaziya lêhûrbûnê,
- Derengketina pêşketina zimanî û aqil û hwd



- xemgîn, êrîşker,
- zû ditirse,
- bêhedar, tirsonek,
- Fedok

Şêwaza ragihandinê di rewşa gumanbirina berxeterbûna tenduristiya zarok

Eger te nişaneyên berxeterbûna tenduristiya zarok dîtin, divê van karan bikî.

1.



**Dîtina nişaneyên
berxeterbûna zarok**

2.



**Haydarkirina xizmetên civakî/
memûrên parastina zarokan**

nav, têkilî (*Belgeya şehediyar divê were
dagirtin hevrê di gel*)

3.



**Nirxandina metirsiyê bi karzanekî
din ra „Prensîba 4-Çav“**

(Belgeya nirxandina metirsiyê)

Rêzikên tevgeriyane



Rêveberiya wergirtinê ya parêzgeha Niedersachsen'ê rêzikên tevgeriyane yên pêwîstiyêner ji bo rûbirûbûna di gel zarok û nûciwanan amade kiriye. Tu wek kedkar, amadetiya xwe ji bo berçavgirtina van 6 rêzikên xwarê radigihîni:

- 1.** ez bi awayekî berpirsyanane bi hemû mijarên ku di dema kar da tûşî wan tîm, tevdigerim. Ez agahiyên nihênî derbarê zarokan û têkildarî zarokan nadim ber destê kesên din.
- 2.** Ez zarokên astengdar û tendurist bi tîgeha nivîsandî di Xala Beranberiyê têkildarî mafên wan bihêz dikim. Ez zarokan li hemberî neçêbikaranîna cinsî, hestbarî an leşî, keysbazî û sersariyê (nebûna çavdêriyê) diparêzin. Ez zarokan di kiryarên ku têkildarî wan in da beşdar dikim û meyl û meraqên wan di plandarêştin û cihanîna çalakîyan berçav digirim.
- 3.** Ez rêzê li ast û sînoran digirim û di rûbirûbûna bi nêzikatî û dûrahiyê da tam berpirsyanane tev digirim. Ez xwe ji hemû formên ziyanbar ên têkiliya bi zarokan ra wek mînak tevgeriyana nebaş û neçêbikaranîna cinsî dûr digirim.
Hemû tevgerên xwedan taybetmendîya têkildarî babetên cinsî (wek mînak ramûsandin, pelandin) qedexe ne. Her yek ji wan kiryanan wek kiryara cinsî tê zanîn ku tê ragihandin û têkildarî qanûnên cezayî dikeve ber şopandinê.

- 4.** Ez pêşketin û şîyanên zarokan di beşdarbûna ji bo teşepêdana bi pêwendiyên xwe yên civakî û pejirandina berpirsyariyê xurt dikim.
- 5.** Ez bi zarokan ra wek kesayetiyan serbixwe tev digerim.
Ez – bêyî berçavgirtina wek mînak temen, cinsiyet, kok û etnik, ziman, dîn, rengêçerm, astengdarî an nêrînên siyasî, bi rêzdarî bi wan ra tev digerim.
- 6.** Ez di rewşa gumanbirina seretayî an dîtina berxeterbûna tenduristiya zarok bi awayekî çawak destwerdanê pêk tînim.



Ez bi rastiya xwe rêzê li babetên xwarê digirim:

- Taybetbûna wî/wê
- Hest û hewcetiyan wî/wê
- Biryardana wî/wê ya serbixwe derbarê xwe
- Cîgeh û rûmeta wê ya hertimî



Ez soz didim ku reftara xwarê pêk neyînim û têkildarî kesên din li dijî wê yekê bisekinim:

- Têkiliya taybet di gel zarokan li hundir û derveyî cihên LAB NI'yê (Rêveberiya wergirtinê ya parêzgeha Niedersachsen'ê)
- Sersarbûn û cidînegirtina gotinan
- Xelatên pere û ne-pere bo zarokan
- Her cûre navnotî û navpêvedan
- Biçûkkirin, berçavnegirtin û aşkirakirin
- Cihêkarî, azirandin û qewirandin
- Tundûtûjî û gefa derbarê pêkanîna wê yekê
- Hemû kiryarên xwedan taybetmendiya têkildarî babetên cinsî weke ramûsandin an pelandin û axaftina derbarê mijarên cinsî

